# AV Û BERF

## CİHAN ROJ

(hemî helbest)



Helbest bi halê xwe zarokên zimanekî ne, herçî çîrok in xortên wî zimanî ne û roman kesên bi temen yên wî zimanî ne ku bi her halî dijîn! Ziman û helbest wek dê û zarok in… Heke min dev ji helbestê berneda wê helbestê nava dilê min xirab bikira, ez kezebperitî bikirama. Ez hê jî dildarek helbestê me ku newêrim xwe lê bigirim! Herçî çîrok bûn, xwendevanan gote min, te konê xwe lê vegirtiye em tiştekî nabêjin lê here li warê xwe dayne û min ji wî warî jî bar kir ez çûm warê romanê. .. Ez ê bi romanê re rêwitiya xwe berdewam bikim.

Ev dosya weke hemî helbest, dîyarî ye bo xwendevanên Kurdî ku îro ro bi eleqe ne. Berhemên elektornîkî jî êdî rastiyek weşangeriyê ne.

Hemî maf parastîne. Hemî helbest bi qeyd û bend in. Dosya heya niha di arşîva Weşanxaneya J&J yê de jî parastîbû. Mala Azad Zal ava be, wî bi dostaniya xwe, her qedir li qerarên min girtin. Heke min bo çapkirinê teklîfatî lê bikira helbet wî ê biweşanda. Lê herî dawî di salekê de du heb romanên min weşandin. Nedibû ku di demeke kurt de ev dosya jî bihata çapkirin ku heqê me tune em weşanxanê ji alî aborî ve jî têxin tengasiyê. Wek kesê ku êdî helbestan nanivîsîne, hemî helbestan em bigihînin ber destê xwendevanan. 3.06.2016

**Hemî maf parastî ne, bêyî destûra nivîskêr tu kes nikare kopî bike, çap bike.**

**BO BÎRANÎNA DENGBÊJAN**

Dibêjin her mirovek rojhilatî helbestvanek e. Ji bo me kurdan em dibêjin her kurdek dengbêjek e;  hem deng e hem jî gotın-helbest e. Vêga serhonaz û hostayên vê toreyê, dengbêjên dengbêjan, em deyndarê wan in.

Ji bo roja ziman(13.05.2013-Îzmir), teklîfatî li min hat kirin da tevlî çalakiya helbestê bim. Di çalakiyê de dengbêj Nîhat jî amade bû. Me helbestên xwe xwendibû. Mîkrofon di destê dengbêj Nîhat de bû. Em li benda wî bûn ku kilamekê bêje lê wî wisa got:

“Gelo Cîhan Roj dikare helbesteke xwe a din bixwîne!”

Her kurda/ê ku guhdariya dengbêjan kiribe helbet pê dizane bê dengbêjek tiştek wisa gotibe ji bo helbestvan tê çi mehneyê!

Wê şevê, ez êdî bi qerar bûm; min ê helbest wekî dosya amade bikirana!

Dosyayê diyarî dengbêjan dikim…

**Cîhan Roj**, di sala 1965 an de, li gundê Înaqa Gimgimê tê dunyayê. Dibistana seretayî li gund, ya navîn û lîse li Gimgimê xwendiye. Despêka bi kurmancînivîsana wî 1993 ye. Di heman salê de helbest û çîrokên wî têne weşandin. Dîwana wî ya ewil "Ratîka" di sala 2002 an de çap bû. Roj, berê pênûsa xwe dide beyarên çîrokê û xwe li romanê digire.

**Berhemên wî;**

* Ratîka (helbest), Weşanên Sî, 2002 – Stenbol

* Meyman, (Çîrok), Weşanên Lîs, 2006 – Amed

* Deriyê Çîrokê (Çîrok), Weşanên Do, 2008 – Stenbol

* Aqil Diçe Sewda Dimîne, (Helbest), Weşanên Do, 2008 – Stenbol

* Gîtara Bê Têl, (Roman), Weşanên Do, 2009– Stenbol

* Meşa Moriyan, (Roman), Weşanên Evrensel, 2011 – Stenbol

* Perde, (Roman), Weşanên Na, 2012 – Îzmîr

* Sehne, (Çîrok), Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd, 2013 – Duhok

* Ji nû ve Gîtara Bê Têl, (Roman), Weşanên J&J, 2014 – Amed

* Serkêş, (Roman), Weşanên J&J, 2014 – Amed

* Hurcahil (Roman), Weşanên J&J, 2015 – Amed

*Reş(Roman), Weşanên J&J, 2015 – Amed

**NAVEROK:**

1.Ro bi bask e
2.Piliya berfê ya ku li qeşayê dani ye
3.Pirsên qirêj ji avê dikim
4.Hewrên bêhn pêketî
5. Çîroka hezkirinê
6. Çîrçîrok in
7. Hevaltiya bi pelekê re
8.Tîrêj
9. Labîrentên sayakî
10.Hîs e rengê jiyanê
11.Rinda min
12.Newaya kelekvanekê
13.Sêva bi birîn
14.Seba te
15.Tu û helbest
16.Ruhêm
17.Te digot
18.Teklîfatî
19.Helebçe
20.Dayika rengan
21.Navekî nû di dilê min de
22.Çîrokên bi çarpîkan ketî
23.Ji bo destpêka evînekê
24.Lêvên belekiyên berfê
25.Banga li ruh
26.Di tariya çavên şevê de
27.Dikarim bi hewran bigirim
28.Jeng bila li xelekan bide
29.Kolî poşman mam
30.Xew û xewn
31.Peyv çavê te ne
32.Bi silavên pişkivî re
33.Tarî li çavan kila qîrî
34.Sîsar
35.Çiv
36.Tîna pênûsê
37.Yar
38.Dengê nû
39.Helbest çivîkek piçûk e
40.Babisor
41.Evîndar jî li ser avê dimeşin
42.Çîroka te jî ma
43.Lehiya gunehên bêqewl
44.Çîrokên derî lê vekirî
45.Ma
46.Dora gotinê dora dilê min ê din e
47.Şeva çîrokên baskşikestî
48.Kenê li dû miriyan
49.Ji bêdengiyê re newa
50.Balîf, xewn û xeyal
51.Ruhêm bibe çûçikeke çolê
52.Av û berf
53.Rengê wechê keçikan
54.Roj ji keçikê xeyidî
55.Sibe her sibe ye
56.Çil û heyşt
57. Du hezar û çardeh
58.Qaqlîbaza’m
59.Reng û xeyal
60.Dora qurbaniyê.

61.Li benda biharekê
62.Memê zindanî
63.Têl
64.Dicemide
65.Şewat
66.Birîndar
67.Çavên gojibûyî
68. Dengek bihare
69.Zarok
70.Were
71. Jahr
72.Leyla
73. Îro sal 2015 ye
74.Ciyê ku roj lê hiltê
75.Sergo
76. Tîna pênûsê
77.Tîn
78.Şivehelbest
79.Danên helbestê
80.Şar
81.Çewkî
82.Pirtiyên hevokan
83.Reşbelek
84.Zemanê birçî
85. Azadî
86.Gihayê hewşê
87.Çarşiya Vartoyê
88.Kanîsark
89. Keleha Mêrdînê û filanîstan
90.Jan
91.Bajarê Xwedawendan
92.Karesatên tenik
93.Bihara dûr
94.Peyvên zindanî

## RO BI BASK E

***(Wextê sî û çar deng, bûn siyeke sor, welatekî vegirtin, ji dilê min hat helbestekê lê bikim, min lê nekir; ger min lêkira ê dilê min rihet bûya; siya sor, her ma li ser dilê min! 02.11.2012)***

dihatin bi karwanî

bi dengên zîz, bi dilên ezîz

li malan, li ser lêvan

peyv sivik, hevok rengîn bûn…

wext bû,

ew ê bihatana

li ser dilê wan

gotinên gulgolînî…

ro bi bask bû

belekiyên berfê, bi xwînê re, diheliyan!

zeman,

bi navê "dîroka meytên sar" bi nav dibû…

yên ku kefîla dengan bûn

dengên xwe dan asîman;

dê, keç, yar man bê silav…

dê;

kefîl e

dê;

deng e

dê;

bask e

ber bi dilê xwe ve...

**PILIYA BERFÊ A KU LI QEŞAYÊ DANI YE**

min ji peyvekê bipekînin
piliyek berfê me
li ser qeşayê

ji qeşayê
diherikim avê
bila kelekên we hebin
ez misqalek av im

li deryayê vebin
av ji berfê hêniktir
ez misqalek im
hûn bi dilopan şad dibin

peyvekê bêjin
derbarê min de
nîvî jê,
kelam
nîvê din,

**PIRSÊN QIRÊJ JI AVÊ DIKIM**

ji avê re bêjin
pirsên ku bête kirin êdî neman
pirsên ku li ser rê li benda qirêjbûnê ne…
ev tirsek e
heya ku av karibe paqij bike;
ê ew pirs ji ba, ji axê, ji hewayê bête kirin,
her roj!

ji avê re hûn bêjin
pirsên avê hene
pirsên paqij ku dixwazin gemarî bibin
ev jî tirsek e
bêyî pirsan, dixwazim ber bi avê ve biçim

**HEWRÊN BÊHN PÊKETÎ**

zeman gunehkari ye

her ku tu, guneh, dibêjî

ku tu dibêjî, guneh

hemî ‘gemarî’ dibin hulm

hewrek li ser serê me digere

ku nikarim navekî lê bikim

tu,

dia bike ji bo avê

lê bêhn bi hewran ketye

mêr

kani ye

kanîgenî!..

**ÇÎROKA HEZKIRINÊ**

xeyalên min têra hevokekê nakin

peyvek kêm dimîne

kîteyek ê peroşên min gemarî bike

henaseyek kin

deqîqeyek gelek dirêj

çêjek ê bênav bimîne

kenek bê pênase

yek-bênefes

yek-bêxeyal

yek-bêzeman

yek-bêyî pênase

helbestek e serhevde; a ku kevn dibe lê kartî nabe,

çîroka hezkirinan a ku di peroşan de maye…

**ÇÎRÇÎROK IN**

çîrçîrokan em mezin kirin,
hûn ê bêjin;
siya hîvê
bêdengiya tariyê…
min di çîrçîrokan de tahmijand,
hûn ê bêjin;
negihaştina evîndaran
qama lehengan
ax, piştî çîrçîrokan,
em ê bêjin;
helbest nayên nivîsîn…

yên ku nabêjin, eşq tarîti ye
bêhn dide eşq
nêzî gulê
dûrî tarîyê ye,
ew in qelemdarên bê kaxiz…

## HEVALTIYA BI PELEKÊ RE

ji bo çi ji dilan tê ku
bengîtî, eşq û nav werin kolan?
tirsa bîrkirinê xwe dabe der
û ewqas hêsa be
wê çi bimîne li dû?
rojekê,  pelek ku bayê ew bi min re bi heval kiribû, hebû
hevaltiya bi qasî du gavan!
du gav û çend peroş
heman bayî ew bir, bi ser bahrê xist
di rojên xedar yên zivistanê de,
ba dengê xwe bi ser min dixe:
“te xwest ez pelê bibim
dizanim
pel
her bi te re ye
diviya min pêşî peroşên te bibirana
pey re wê dor dora pelê bûya”

**TÎRÊJ**

ken li lêvên wê yên tenik şerbet e
destên wê li te rapêçayî
nihêrîn diherikin dil

tîrêj
reştariyan dide ji bîr kirin
ew
bi peyvekê re
dibe bexçe

tu zarokek î
aşebaşên te
dibin sûc;
dengek, bi hêrs;
qerarek bêyî danîşîn…

dengê te mehsûm
kenek
xewnekê daye dest pê kirin
ew qas
hew qas!

hay jê çêdibî
ew ne hazira wextê ye
tu bi kenê re serî diavêjî xewê
xewnek nû nîn e
derewek li derewên heyî zêde dibe
eşq!
heye, tu dibêjî
heya ku xewna wê hebe…

a ku wenda ye
li wê digerim
gavê
deqê
saetê
dengê di xewnê de her dengê wê be jî
ew ne hazira wextê ye

lêgerîn bi xewnê giran tê
tenêtiya min
peyvek e
li helbestvana xwe digere

## LABÎRENT Û XAÇEPIRS

xaçepirs û labîrent nemane

pêşerojek

ku weke eşqê sira xwe wenda kiriye

ji niha ve

tê û diçe

bêtemen…

**HÎS E RENGÊ JIYANÊ**

te di neynikên şîn de dibînim

şevên çiksayî yên çilê zivistanê

şînê asîman neynika min e

di peyvan de te dibînim

peyvên ji bo her kesî kartî

li ser zimanê te ter

axxx dibêje dilê min, di kêliyên têkçûyînan de

ax, xwezî min ew qas nenasiya

min reng ew qas hîs nekirina

ji peyvan neynik çênekiriba

baş e ku kêliyên têkçûyînên min parçe ji hewrên havînê ne

dişibin axîneke temenkurt

baş e, dibêje dilê min

neynika min şînahiya asîman e

peyv zimanê neynika min in

meriv zor ji te fehm dike

tu metnek bê herf î

hîs

tu bi vê dizanî

wexta tu kenên temenkurt dîyarî berf û baranê dikî

hewr reng diguherin

hîs bi hezkirina te re qedîfeyi ye

ger bihata zanîn…

dizanim

xwezî min nizanibûya

dizanim

ger bihata zanîn…

**RINDA MIN**

rengê di hevokê de dibînim

hevokên di rengan de sebra min in

her mirineke sivik encama rêwitiyeke bi jan e

rengê mirinê tune

hevokên di mirinê de dimînin ji pepoyan re

ji niha de rinda min

ji niha de reng bide hemî hevokên xwe yên veşarî

reng jî zimanek ji zimanê hevokan e

**NEWAYA KELEKVANEKÊ**

ez nizanim, nizanim
ez ê çawa karibim helbest lê bikim;
kenê te helbesta xwe dixwaze
çavên te helbestên xwe dixwazin
gerdana te doza helbesta xwe li min dike
li ku ye hê çîroka helbestên di rêya te de;
çend kerî helbest divê ji bo sohbeta te
ez bi vê dizanim!
kîjan peyv sivik dimînin
kîjan peyv dikevin halê silavên te
min ne hêsirên te yên zarokane ji bîr kirin
ne jî tîna nihêrînên te
rengek heye di vê helbestê de
dengek heye di vê helbestê de
ez dizanim, hew ez dikarim bibînim
hew ez dikarim bibihîzim
vaye tu di vê helbestê de diaxivî
dimeşî
bûyî helbesteke ji dilê xwe
maçên mîtolojîk bi bîra min tînî
ez ketime halê bêdengiya masîgir
bi tevî keleka xwe, tu mayî li ser dilê min
ne ji te tê tu xwe li pêlan bigirî
ne jî ji min tê ez dengekî bi xwe bixim
ev e, ev helbest pêl e ji bo keleka te
bila dengê dilê min her bimîne ji bo kilamekê
newaya kelekvanekê bûye navê vê helbestê

**SÊVA BI BIRÎN**

dilê te û sêva bi birîn çiqas dişibin hev

mîna zarokek birçî, bi gavên sivik, bi lez, ber bi te ve têm;

hinek li rengê te dinihêrim

çavên min bi birîna te dikevin

mad li min tirş dibe!

tu sêv e bi tevî birîna xwe

ji hemî dermanan dûr

destpêkek vê çîrokê hebû;

peyvên bêwext kurm, ez birîn tu sêv bû…

**SEBA TE**

seba te,  ez av bûm,

gotinên sivik û kurt bûm.

ez ji bo te, çûçika çolê û sadebûna dilê jinekê bûm.

te ji min hez kir,

her ku te ji min hez kir,

te nedixwest hay jê çêbî ku

hezkirinên mezin min ditirsînin.

tu dibêjî ez robarek im;

bi min tu ava biharê ya robar î;

navan li xwe bike,

piran ji bîr meke.

bila pir dilê min be

kî ji te hez bike

pêşî pê li dilê min bike

ne peyv li min diqedin

ne jî gotinên min bi avê de diçin

ma ciyê ku tu lê bî

hukmê stûxwariyê dimîne

gotin sar dibin

peyv dimînin bi halê di ferhengan de

tu vaye di dilê min de

bi dilê xwe yê helbestî

dimeşim di sikakan de

bêdeng

bi nêrînên kûr

kî li min dinihêre

hîs dikim ku ez li ber çavên wan çîrokane me

lê ku bizanibana di her kêliyekê de

tu bi rengekî xwe li dilê min şax didî

wê pirsekê ji xwe bikirana

bi halekî din li dinyayê binihêriyana

du ziman li cem min bûne zimanek

du welat di dilê min de bûne welatek

ne wanî bû

tu bû sedem

ez karibim bi dehan welatan di dilê xwe de bikim welatekî

te rê da dilê min

te nav li gotinên min kir

û

bû berga hezkirinên min

navên te hene li cem min

navên rengê dilê te

wexta ez çûm min navên nû li te kir

ku ez ji te dûr ketim

çiqas peyvên helbestî hene ber bi dilê min de rê dan xwe

heya ku tu vê helbestê nexwînî

dizanim wê dilê te bi hêrs û bi kerb be

hezkiriya min,
beriya gerdenê
li kolyeyên li dilê xwe binihêre
ka çend rengên bênav xwe didin der

tu ji min ne dûr î
aniha bi min re bi sohbet î
çiqas helbest hene, bûne av,  bi ser dilê min de diherikin

asîmanê şîn çend gav dûrî min e
xweda emra xwezayê daye dest min
ba dibêjim
baran dibêjim
tav dibêjim

li te digerim
bêriya te dikim
naxwazim dawî li vê helbestê were
ji te hez dikim
bi qasî kenê zarokekê

tu mayî di dilê min de
şer meke
ne hewce ye
bi tenê mirin maye ku karibe min ji hezkirina te bike

**TU Û HELBEST**

ji rengê porê te xeyalên min hene

ba lê dixe li pelên ketî yên zerik

naxwazim ji dest û pê de bikevim

lê haya min ji gavên min tuneye

beden bi min giran bûye

dengê dilê xwe dibihîzim

li te vedigerim

tu, ya ku dûr

li ber çavên min, helbest dadipale ji hinarikên te

tu ne li vir bî jî

helbest li vir e

tu werî jî êdî zor e helbest biçe

wê helbest jî nikaribe dest ji te bike

**RUHÊM**

ruhêm,

bedeneke din bibîne seba xwe,

derkeve hemberî min!

kêliya derketinê baş bibijêre

bila baskên çavên min daketî bin

baskekî min Farid Farjad yê din Tara Jaf be.

wexta tu di bedeneke dinde yî

ezê dîsa wê bedenê nebînim

ê bi te re bi sohbet bim

zanî

kenek mabe bi min re

sohbetek bi tîn

û kêliyeke ji ruhên hîs dikin

dibin, hemî evînên min

mayînde

bi qasî temenê kevirekî pûç dirêj

wexta kevir bipişire

tu ê bibûyî av

min çendî peyv diyarî şevê kirin

çendî hevok bo tariyê

bûn stêrk

û çîrokên minminîm

min xirabeyên Agorayê veguhestin odeya xwe

sirekê ji Pramîdan

devê mexzenekê ji Heskîfê

ax, xwezî min karibûya ji firînên bê bask helbest lêbikirana

ax, ji kenên mane bi însan re…

ax, ku ruhekî din,

diherike ruhê însan, însan karibûya şopa wê bikira helbest!

nehatiye nivîsîn

ê neyê nivîsîn…

ax, ruhêm, li bedenekê negere!

ruhê, ruhên ku herikîne nava te,

melodiya wan bi deng bike, di nav tarîtiyê de;

wexta hîv wenda ye

vê tariyê

ew melodî,

dikare ronî bike…

**TE DIGOT**

Te digot ez deng im.

Ka sewta te?

Te digot ez dil im.

Ka kilam û helbestên te?

Te digot ez yar im.

Ka bextê te?

Te digot ez jan im.

Ka, ka kenê te !

Te digot ez silav im.

Ka, ka qasidê te ?

**TEKLÎFATÎ**

bêhnek, dido, sisê;

li ser hev, bi heyecan

lêvên bi lerz

li rabûnê bû ew

ez ji teklîfatiya wê dûr

çavên wê li ser min bû

ji çavên wê min jiyanekê bo xwe girt

bi yekcarî, bi hêrs ji min bi dûr ket

gavek, dido, sisê

bi lez

wê nedigot, lê dengek bi ser min ket ,"ehmeq"

min ji wê jiyanekê wergirtibû

wê ji "tirsonekbûna min" fam kiribû!

wext borî

ez bi heyecan bûm, çav li wê tas

min got dor a wê ye

hatiye heyatekê bibe ji bo xwe

**HELEBÇE**

ne hewr bûn dibêjin

diranên marên korbûne jahr

mirin, ma wexta kêfa te bû te kêf dikir!

tu hê jî li destên bi hine digerî,

li dilên piçûk,

li jinên bi tîna mirazan distewin...

ew kî bû rahiştibû temeziya ji jarê

bi govenda meytên sar şadibû!

kî bi diranan hêlkana 'Miriyên Adarê' dihejand!

û jar vedirişiya,

maçên zarokan di axa sar de veşart!..

**17.03.2001**
**Piştî hêsrên Berzan...**

**DAYIKA RENGAN**

mû bi zimanê wan ve hatiye
qirik li wan bûye pîşo
dibêjin, me deng daye
em reng didin
ji rengê xwîna zimanê xwe!
ên ku gotin,
ên ku dibêjin,
ên ku ê bibêjin
li ber tava hîvê
di rengê berfê de
zimanekî dikin rengekî
reng dibe peyvek
peyv dibe dilek
dil dibe welatek
welat dibe dinyayek
dinya dibe dengekî
dor dora dinyayê ye;
dibêje, ez dayika rengan im...

**(by Cihan Roj on Dîrok û dem**

**30.01.2011/ facebook)**

## NAVEK NÛ DI DILÊ MIN DE

bi tenê,
aniha,
min dixwest li lûtkeyekê bûma,
pêşî, ez ê biqîriyama
min ê kilamên xwe bigotana
bi kilamên min re
pelên hemû daran, di kêliyekê de,
wê li hemberî bayê xedar li ber xwe bidin
peyvek
belkî navek
belkî tu
bibûyayî çiya
an jî şev
an dengê min
belkî ez ê neqîriyama
bê deng
mîna esmên
şîn
û tevî stêrkên xwe
wê bibûya navekî nû yê di dilê min de
min fam kir
dizanim
û min jî gelekî guhdarî kir li çîrokên evînê
nizanim
ji bo çi, di kêliya av vexwarinê de jî, bi çavên serê xwe, li te
digerim

**Bihar 2007**

**ÇÎROKÊN KU BI ÇARPÎKAN KETÎ**

min hez kir, ji çîrokên ku bûn dergûş û bi çarpîkan ketin
min hez kir, ji dengê avê yê ku di qatên şevan de tevî
dengê dilê min dibû...

li kaniyên li serê rê û dirbên destanên pînekirî, kenê te,
bila tevlî axê be

wexta ku per û baskên çivîkekê derî li birîna te vekirin,
gotinan bicine

bi kenê şîrîn, bêhna axa baran lê barî, bike gotin û di dilê
xwe de lala bike

bila ev ji tîna qewlên min û te de, bibe tayên lihevketî yên
giloka ku di dil de hilnayên

**2005**

**JI BO DESTPÊKA EVÎNEKÊ**

û min nivîsî
cara pêşî
helbestek
bi zimanekî biyanî
ev sewda
bi her zimanî tê xwendin...

kî dizane
niha tu bi nihêrînên xwe
ya li asîman
bi dengê veşarî dixwînî
bi tenêtiya xwe ya helbestî
tu, bi gotinan, a di dil de der dikî
ez bi peyv û helbestan
peyvên min,
gotinên te
dibin dilopên hewran
hewrekî qedexe
ku hew ez û tu bawerî pê tînin

**Bihar 2007**

**LÊVÊN BELEKIYÊN BERFÊ**

*(singê helbestê asîman e... paşila wê pêsîrên bêşîr e*

*lêvên helbestê, belekiyên berfê ne…*

*dilê wê, dilê çûçika çolê ye)*

ji rojê, heyvê û hemû gerestêrkan wêdetir

asîman heye

dizanim, ez ê çendî caran bimirim

heya cara dawî,

heya ku asîman reng biguhere

**BANGA LI RUH**

tu dîsa têyî şûştin;
wek her carî
sivik î

minminiyek e
bangî ruhê te dike
ber bi newayên xwe ve
û ez hest bi dengê te dikim
li dû te bal li min sivik dibe
bi te re tahm bi janê dikeve
çi jan e,
dibêjim ji şeva ker û lal re

**2006**

DI TARIYA ÇAVÊN ŞEVÊ DE

te, şopa çemek ku av lê miçiqî bi bîr anî
rûyê min li ber çavên te ye!
di kolanên bihecok de,
bi dengan şad nabim
kî dixwaze xewnên xwe bifiroşe,
lê jixwe
di paşila her kesî de, xewn hene

min bêriya miriyekî kiriye
min digot qey
ew min dihewîne
di van şevreşkên ku dişibin qehpikên
behîşt di dêv de

bila stranan bibêjin,
yên, aniha, li her deverê zarokên xwe di-hejînin
bila mirî bi ken bin
gula beroj heya berbangê bêhn vede
ji min pê ve kes deriyê tariyê
yê dadayî nebîne

em ji çîrokên ku bûne xwelî de tên
ne felc li mirinê dide
ne jî bi gopal digere mirin

ey şeva ku bûye gundek wêrankirî
tu îşev li min bûyî,
çûçikên Sultan Silêman û Feqiyê Teyran
de tu baskokî, birîndar bimîne li ser milên min
bi newaya qêrînên Kerbelayê;
tu bi ya dilê min
ta kingê diherikî;

em ji çîrokên ku bûne xwelî de tên, derdê'm!
dîroka me hinneya keviran e
tifû dikin em pêşî
bi dû re, bi rengê li destê xwe şa dibin!

**DIKARIM BI HEWRAN BIGIRIM**

keresiyên welatê min jî
mîna rûyê te yê bitavî bûn

hêviyên bi bar in mane li ser per û baskan
bi dilek safî
û bi hubreke şîregermî

ez ê hew li bişkoveke bistiyên te
li şevên xwe bikim
asoyek safî biken
rojên xwe bikim boxçe, li baskê dil bikim
dîsa bi biryarek, bi qasî berbangê sivik û paqij
bibim dergûş, xwe bi sîngê jiyanê ve bişidînim

wexta ku te di şûna arê dil de zarokek hembêz dikir,
çavên te kevz di tariyê de dihiştin
jana min hebû lê nizanim li ku dera min dida
mîna gulleya nêçîrvanek ku li lingê şêrekî birîndar
bikeve

**2005**

**JENG BILA LI XELEKAN BIDE**

her ku evîn li te dibe pûşê di hêlînan de

bi ser me de têjikek bi firê dikeve

li sikakan, di nêrînên xav ên zarokên parsek de

dibim xunav û ber bi hewrên te ve hildibim

di para dilê min de tu çi qasî şêrîn î

hew ez pê dizanim

û

hew ez pê dizanim

“tu mîna xwe yî hê jî

di dilê xwe de

bihar î” ji min re dibêjî

lê mîna li zivistanan bî, bi dû ketî gulan berhev dikî

**2006**

**KOLÎ POŞMAN MAM**

kenê te û dem li hev dikin
çavên min û dilopên barana payîza dereng
(wexta ku te derî bi ser min de qefalt,
min got qey sawa Nebiyê Axirzeman û Îsa
li ser her du milên min in
û ez bûme Mûsa li ser deryaya exlaqê dimeşim!..)

tu û keweke di derbiharan de bask lê şil bûyî li hev dikin
ez û kokeke dara spîndarê ya di devê çêm de hatî birîn

(tu îcar jî biskekê ji porê xwe bi lêvan şeh bikî
û li benda min bî, da ku ez dêrî biqefilînim,
ez ê bi qirşikekê re li hev bikim;
bi ser lehiya kûrahiya dilê e bikevim)

**2003**

**XEW Û XEWN**

li ser heft çiyayan, li paş heft deriyên hesinî
moriya xewê di guh de, razayî bû
sal çûn, meh çûn, roj çûn...

lê ya ku tu car ji ber serê min neçû tu bû
mîna teyrê sîmir ji çîrokan were
bi heyrana te me
ne roj diçin, ne meh, ne jî sal
hêlîna derdan bi tenê bihêle ji dilê min re
lê tu piştî xeweke sivik li esmanê şîn binihêre
belkî dilê min ji bo te êdî asîman e

**MEST**

min Cizîrî xwend

mîna dergûşek têrmijiyayî di xew re çûm

dikirin qêrîn dengên di xewnên şevan de:

''werin nava dil û gurçikan,

peyvên sivik, gotinên bihare,

hêviyên mane ji her dem û dewranê re...''

**2006**

**PEYV ÇAVÊN TE NE**

deriyê dilê xwe veke

deriyê... dilê xwe veke

va ye tav li baniyan şêrîn dibe

bila gula îro tu bî

dengê sibehê ez

helbestekê lê ke;

ji bo ku tu jî bibî dengek sivik

ji bo ku dilê min nebe deng

hew bi dengê te olan bide

dipirsim ji çûçika çolê

dibêje

peyvên wê yên virnî bi firê ketine

gava ku tu bi qasî du gavan ji min dûr î,

dipirsim ji çûkan

dixwazim te ramûsim

bi qasî peyvekê

peyv çavên te ne

riste tu yî

ev helbest dilê te ye

maye ji min re

**2007**

## BI SILAVÊN PIŞKIVÎ RE

bûye ken û li parçeyên hewran şîn hatiye...

diherike av ji belekiyan de...

diherike bi ser kevirên bi hine de çîrokên devkî...

ken maye ji masîgirên li qeraxên çemê şîlo re...

derbiharê

li Vartoyê,

heyran im

wextê dengên bi coş dibin newa:

”weleh êdî bihar e...”

**TARÎ LI ÇAVAN KILA QÎRÎ**

malek ku tarî tê de bûye çemên biharê,
febrîqeyên cixarê
û hemî ayetên ji fenên împaratoriyan hûnayî tê de ne…

fermanên li ser janên me dibûn parçeyên hişkerik,
gilokên ji berfê ne,
bi neçariyên stewr dihele
çem li pirtûkên bi zimanê xav diwerime…

ji zarînên pirtûkan,
şitla li devê kaniyek piçûk çandî min ew şitil bîr ve kir…
çem, bi gilokek berfê, cîhanek da ber talana xwe,
kanî hê jî li reha xwe rast nehatiye…

malek û tê de evîn bûye agir, rûpelan dişewitîne;
hirîna Kileopatrayê
û her gotinek li dora min dibe zinarek,
tîna riya ez tê de, tîqetîqên Kileopatrayê yên fetisok
dişewitîne…

hulma ji axînên Mem li maran dibe dûyek tehl î zirav
û aniha dilek azad bibûya keziyên hevrîşîmî…
ken û çîrokek evîn tê de gotinên şêrîn in
li vê tariyê birista,
min dê çayek girtî

û hemî çîrokên avlêketî beredana ser zimanê ruhê azad

û ez ê bi nermiya porê wê bi rê biketama

çi qas xwêdan li min wekî kaniyên serhedê der bibûya,

min dê bi siya tayên bişkivî,

careke din risteyên evîna vî welatî birista

ev kêlî

benek rizi ye

bêhna qutîka cixarê bi hawara min de hat

û merheba însan,

hubir li evînên we diherike…

**SÎSAR**

şirîna tariyê bû bê pêl diherikî,
di nihêrînên avis de ro diçû ava…
ji biskan de agir di xwêdana kekê min de vedimirî.

bi baranê hat şûştin, bi pelan hat nixamtin.
dewrêşên şoreşê di tariyên rizîyayî de lem li bext vedigirin.
diya min laçik li hêsiran kiribû bend,
deng li gorê diçand:
''dilê min rê dikişîne
xewn li min sikesar,
va ye min dil dîsa li ber serê te hişt.''

*Salên nodî*

**ÇIV**

îbrahîm li êgir bûye av dîsa

dîsa dem dibe destpêka çîrokên neguvaştî

*Salên nodî*

**TÎNA PÊNÛSÊ**

û dem kêliya li ber devê şûrê şêr

pênûs şara zirav

li stuyê min.

bihar e,

belekî hêsiran sar dikin.

*Salên nodî*

**YAR**

min xwest risteyên ji bo te dinivîsînim

bişibin zarokekê…

zû li xwe mukir hatim;

zarok qatê şevê nabînin,

tu wextek şeva min î;

wexta tu bêdeng î û ji şeva min dipirsî,

dem, ji hukmê şevê dertê…

axx,

te bizanibiya te çi berdaye canê min,

bi kenê xwe,

bi dilopek hêsira bi tenê re,

tu dibî xwîna şîrîn, xeyalên min bi rih û can dikî

gotinên te, li ser dil, berfa pêşî ne

te

ez guvaştime ji dil ve…

ezê ji çi xatir bixwazim

li ber pêlên gotinên te

her cara dibim nalînek şîregerm

dizanim, min hest bi neçariyê kiriye…

ji delalî,

bi ken î…

ji lêvên ziravik de, ji gotinan jê yek bila jehrî be

gotina xwe bi rihê min bide

çi bi te eşkere ye

bi bîr bîne

çi gotiye Karapetê Xaço di kilama Zembîlfiroş de:

“aqil diçe sewda dimîne”

**DENGÊ NÛ**

hinek bi lalî

bêyî peyvê

we bihîstiba mîna min

hûn dê bi dû hêmayekê biketana

ji bo dengê nû

hinek zelal

şînek hatî şûştin

we binihêriya mîna min

we dê ji rengek nû hez bikira

**2007**

**HELBEST ÇIVÎKEKE BIÇÛK E**

bila helbest
xwendevanan
wekî dergûşek têrmijiyayî
neke xewa şîrîn

xwendevan bi dilê şad be
mîna bêhna biharê bi ser bikeve
hinek bicemide
bi melûlî binihêre li asîmanê şîn
piştî helbestê xwend, karibe maçek şîrîn li rû yara xwe,
dengek sivik li jiyanê,
û gotineke nerm a mê
li sibeha xwe zêde bike…
rojekê da helbestvan bû mêvan
bila xwendevan bi ken be
çîroka xwe vebêje
helbesta helbestvên wekî gotineke çîrçîrokî bi bîr bîne

**2005**

**BABISOR**

çîrokekê li gerdana pelên dil lêdike
bi dengê tirîfroşê li Babisor*

ferîşte ji ser milan de ketine riya Dêra Zaferan
reş dimeye li çavên keçikên ereb
ku di tariyê de ji têlên jengarî xwîn neherike,
wê asûriyek çend gotinan ji rengê xwe yê şimayî de vereşîne

lêv li min dimiçiqin...
çûçikek çolê bû zarok, bi sêzdeh teqînan
li ser dara karesatan bi cî nabe

**EVÎNDAR JÎ LI SER AVÊ DIMEŞIN**

min dipirsî,

tu di paşila şevê de li çi digerî?

ew bû a ku digot:

“fêm nake... wekî kerengperekê li evînê datîne...”

**2002**

**ÇÎROKA TE JÎ MA**

tu bûbûyî agir

dar şewitîn

tu bûbûyî agir

karwan bi ser rê ketin

tu bûbûyî agir

kevir bi reşahiya xwe wekî pirtûk man

her ku tu bûyî agir

piliyên berfa baniyan man di govendê de…

"çi tedbîr ey misilmanan

……………………………..

li ser wechê çiraya me."*

***ji qesîdeyeke Mewlana Xalid**

**2002**

**LEHIYA GUNEHÊN BÊ QEWL**

ez hînî guhdarkirina dengê xwe dibim

tu bagerên tirsa xwe bi bîra min tînî

rengê hubra te bi ser xwêdanê ketye,

tu ji temenê xwe ditirsî, ey ferîşteya nivîsên reş,

ji lehiya gunehên bê qewl ditirsî tu… tu…

**2003**

**ÇÎROKÊN DERÎ LÊ VEKIRÎ**

destên min ber bi te ve vekirîne
dûr î tu
dûr dûr…

hewr bûyî tu, bêyî ba, diherikî
birîna bi min re bi tariyê rapêçayî

zarokek dimeşe aniha
birîn li min bû dilopek şîregermî
hildibe hildibe ber bi hewr ve

peyv şil dibin
bê nukul e ev kevok êdî

zarokek dimeşe aniha
deriyên çîrokan vekirî dihêle bi çûyîna xwe re…
ey helbestyar
destê demê neşo;
gotinên krîstalî yên negotiyan wê bişkên

2006

**MA**

mîna kezebperitî

ji bo dilê xwe dinale

te tasek ava şor danî ber

bêbexto…

***salên nodî***

*Dîyarî bo xwendevaniya Selîmê Ahmed ya vê helbestê:*

*Aniha, dem, 10.12.2015 ye. Saet 20:50 ye. Kek SelîmêAhmed, di têlefonê de, ji kerema xwe, hezkirina xwe ya ji vê helbestê îfa de kir û got:*

*"Ya ku min ji helbestê fehm kir, tabloyek wisa ye, belkî kesên din tiştên din jê fehm bikin, ez ê wê bêjim, heke qelem li ber destê te hebe lê bike. Min rahêşt qelemê, wî got:*

*"Kezeb lê peritî bû*

*Li ser dilê xwe ji kûrahiya hinavê xwe ve dinaliya*

*tu hat*

*te tasek sîrav pê da vexwarin bêbext…"*

**DORA GOTINÊ DORA DILÊ MIN Ê DIN E**

gotin li ku sivik e; çi wext hênik e, çawa safî û şîrîn e, di çi de dibe bayek hênik û bi bin baskên we dikeve… kîjan peyv dibe vîrûs û bi rihê gotinê dikeve, kîjan peyv bê pêsîr mezin dibe, kîjan peyv bi tena serê xwe govendek e û kîjan peyv dibe newayek û bi dehan peyvan re govenda xwe li dar dixe.

lê şev, lê dil,

lê pirsên dibin morîka xewê,

lê "çavbirçîtiya 'mirovê' biaqil",

lê dar, asîmanê şîn, gotinên mezin, hevokên qîrî, kenên sar ên pînekirî,

lê peyvên bi kurdî yên hatine recim kirin…

na, dora gotinê ne dora dilê hişk e, dilê hişk bi sawê ketye, saw lê mirar bûye, dor dora dilê min ê din e…

deng li ku bê hesêb e, kîjan peyv dibe reng kîjan gotin dibe pêsîr tazî, virnî, bêxem li ber tava nîvro rengesmer diterike.

ferhenga peyvên sar,

ferhenga êşên servekirî,

ferhenga gotinên qusiyayî,

ferhenga gotinên bi avê de çûyî û ferhenga sozên bi qewl û bi qirar bi çend şeran bi çend gotinên dayikane tê derkirin…

tava peyvê, tîna gotinê, siya peyvê û tarîtiya gotinê, barana gotinê, şeva gotinê, roja peyvê, dev, lêv, dil û asîmanê vegotinê…

bi çend avan tê şûştin,

bi çend qêrînan betal dibe gunehên ji bêgunehtiyê xwe dane der,

çendî car,

li kîjan welatê çîrokane,

çendî hawar bi keneke zarokane bi dawî bûye…

însan!

ey însan!

însan!

însaaan! însan!

bi gotinekê bi ser pira siratê dikeve,

bi peyvekê dibe av, bi peyvekê heft heram dibe…

ziman, rih, dil, gotin, pêsîr, çend tinaz, rûyê zarokane, peyveke bûye piliya berfê…

însan,

bi çîrokeke derî lê vekirî dibe mohra axir zeman,

bi axînekê heftê çîrokan vedibêje…

nivîs!

xewnên şevan bibe ji xwendevan re,

ferhenga dilê rezîl,

kêliyên neçariyê,

kenên şîrîn,

hêviyên meyandî,

çend diayan û

silavên sibehên zû…

li ber koka darekê, xeyalê xwe hêtîm dihêlî... li peyvan digerî ji bo ya di dil de… li navekî digerî… gotin mane ji çîrokan bi te re. gavên te, bi pelên di sikakê de sivik tê

a di dilê xwe de bibêje

vebêje xewnên li te bûne hêvî

ger deh peyvên bi Kurmancî tune bi te re

a di dilê xwe de biavêje avê

**ŞEVA ÇÎROKÊN BASKŞIKESTÎ**

êvar bû bablîsokek sikakên ji çavan ve birîndar,

ji çivîka ku hêlîn dabe çemên biharê gêjtir

pey re,  dişibe zarokek ku kûçik nanê sêlê ji dest revandibe...

tu, ji rika yezdanan de dadipalî

îşev şeva çîrokên baskşkestî

bistiyek derbiharan im ez

ji ber birînên esl û fesla wê hatî kirî,

parçe bi parçe yê ku bi ser çemê şîlo ketî

**KENÊ LI DÛ MIRIYAN**

(mirî vedişartin û hêsir, bi kenên tîr re, diherikandin)

diherikîn hewrên havînê li Vartoyê

di dev moriyan de seriyên şîrameyan

li ber xwe didan gotinên bi birînên servekirî

ma lingên te hinekirîne... qey tu li "Şikeftên Pira Xwedê"* mêvan î... ezê hêviyê li baskên teyran bar bikim û di tariya ristan de, ji talana karwanên bê cebilxane, rê li xwe averê bikim...

mirî vedişartin û li dû dikeniyan...

niha dikenim piştî ku hin ristan vedişêrim...

(ba çawa di berêvarên pûşperê de li genimê seridî dibe pêl

li rûyê şimayî, ken, bi wî awayî, dibû pêl)

birînek li me diherike

destên te hinekirîne ma

şidyayi ye li tiliya te gustîl

ya bi ser dil de hatiye

diçe ava, bêyî berêvar

danayne felek şalpeya fedîkariyê ji rû xwe de...

hin jê goştê miriyan dicûn... ya ku li zinaran rê dide xwe, bûye taveke şîrîn li hestiyê me...

**** Pira Xwedê: Li Varto li gundê Kunav e.***

**JI BÊDENGIYÊ RE NEWA**

te peyvên almastî heya ku birin
diayan
heta êvarên lal hêviyan meyandin
ezê
çîroka xwe û te heta darekê bibim
dar
ji bêdengiyê re newayan dibe
belkî dengê ramûsana min û te jî tê de ye

**BALÎF, XEWN Û XEYAL**

**1.**

xem û xeyal li balîfê xwêdaneke tûj in

peyv di dev pênûsê de qetek kal

sikak reng diguherin

gotinên kilaman ne bes in ji şeva tu lê bûyî mêvan re

**2.**

hewa ji hulma te germtir e, ew qas

lê peyv hê sar dimînin li ber tîna dilê te

**3.**

sî ji bejna te kêmtir dişkê

roj ji xwe dixwe

dengê xwe dikim nav merhebaya te

**4.**

tişta ku Gilgamêş nedît pênûsê kifş kir;

bi tevî te û heya stranek ji guliyên şevê rêsayî

**5.**

ji sonda bi ar heya kenek ji mizgînan

guh didim çîroka te ya ji payîza dereng re mayî

**6.**

li Heskîfê straneke ji bo heznîtiyê

em di nav kilaman de bûne deng

bi devkî, peyvên me mane ji axirzemanan re

**7.**

li eniya te di dewsa moriyek şîn a bi benîşt de

çend rê

êdî tu li hêviyan germ dibî

**8.**

ax ber digire

ku kefika dest ji xwêdanê dibe delavek

rist tê de masiyên nîvçe

**9.**

ji dema demê ber bi vir ve

se li avşoyan bi helkîn in

**10.**

ji çavan re jî bask vedigire

dest ji dareke reh lê tazî mayî bi jantir

ba ji henaseyek kûr de bi rê ket

**11.**

çîrok ev çîrok e;

tu li ser baskên teyrê sîmir

ji dinyaya tarî de ber bi dinyaya ronî ve rê dikişînî

kêr

te parçeyek goşt ji canê xwe avêtiye devê teyr

teyr jî ji goştî vedirişe

bi kulekî

li hêviyên xwe lingan sivik dikî

dengek ji teyr, "hooo,  eyyy însaaan,

ma dibe ku ez goştê te bixwim

ka kerem bike bi çend gavan

goştê te di bin zimanê min de bû jahr..."

**12.**

ji hineya li ser destên bûkê sortir in hevokên bi hêvî

jiyan doşegek hevrişîmî

helbest li ser,  dergûşek bi çarpîkan ketî

**13.**

axir û axir destê mirovan li pêsîran asê dimînin

lêv li wan dimiçiqe deng li wan dikeve

di jiyana kartû de hêvî li wan dibe gotinek servekirî

**14.**

mizgîn di kêliyan de girêkek e

ben li tûr riziyayî rist çoyê şivanî

peyv lê tê nîşan kirin

**15.**

te li ku bihîst ku bextê min ji birînekê de diherikî

evîn hê nehatiye xaxê xêzkirinê ku ez ristan, wekî şelteke zirav, biavêjim ser te

**16.**

heya serê mirî li sal dikeve gotin lê tayek ter e

û heywaxek pê dikeve ku yê mirî ew bi xwe ye

û ji mirî re li navan digerin…

**17.**

avê berbejnan heya golên gerînek bir

ristên me hêviyê heya qatê heftan hilkişand

**18.**

tu bûyî peqikek û li zimanê hêviyê jan didî

gotin dişemitin

peyv wekî kevzeya devê cihoyan

**RUHÊM, BIBE ÇÛÇIKEK ÇOLÊ**

**1.**

ji nêz ve lingê jiyanê bi hembêza jinekê dikeve
ka, me peyambereke  jin hebûya!..
min bêriya miriya nekiriba
kî dixwaze textikê xwe bifiroşe
lê jixwe
jin û textik li hev nakin…

**2.**

hesta sivik,  jana tîr
bi vê şeva bawî re li hev nakin
û dema em li xwe vedigerin
nav li ya xwe nakin
dimînin li benda tiştek ne tişt
em û em
bi dengê bi qêrîn re li hev nakin

**3.**

helbestvan wexta peyva herî nazik
û nazdar bi rê dike
wê çaxê, dixwaze bimire
helbest dergûşa wî/wê ye
carna bi ser çavan de mîz dike
carna jî bi ser çongan de dirî
kêliyek haydar bûm ku şeveke hênik e
va dîsa li ser çongên min dergûşek
kî dergûşa xwe daye ber bazarê
lê bi herhal
helbest nayê firotin

**4.**

di dinyaya tarî de gundek hebûye
di gund de hew kaniyek
di lûleya kaniyê de ziyayek
her rojê berdêla avê de
keçikeke bi xemla bûkanî xwari ye

ziyayê vê şevê
ne bi dilê min tê îmanê
ne jî bi kerba agirîn

Hîtîtiyan devê gur bi kêrê girê dane
da ku gur miha wan nexwe
ez ne hînî diayan bûme
ne jî heya niha lavayiyên min bi dengek sayakî bûn
ev e saw bi ser min ketye
dê ev şev berxika min bixwe
kê şevê kuştiye
lê jixwe
şev namire
heya roj hebe…

**5.**

dana esrê
zarokek bi tava rojê re lîstik dilîst
her carî xwe hil dikir ku rojê hembêz bike
halê çardeh saliya min bi bîra min anî
di kaşê newalekê de
li ser zinarê asê
hîv carna bi qasî du bihustan bi min dûr dihat
dilê min mîna ava di sîtila li ser arê mazî
digiriyam
hêsir li min ziwa dibû
hêsir ziwa dibû lê janên dayika min ziwa nedibûn
xewek germ li min şîrîn dibû
wî wextî mîna ku hîv porê min mist bide
xew dîsa li min şîrîn bûye
li bajarê ku asîmanê şîn lê qedexe ye
ez hîvê nabînîm

**6.**

gewdeyê min di giraniya hevrîşîma bi qasî bijangên te de ye
destê min ji wê agiri ye ku li Îbrahîm bûbû destegul
îşev her wekî baskê çûçika çolê me
dinya we bi min giran tê
şeva min dişibe pêşa xewnekê

di lîstikên zaroktî de dihat gotin
ku marê birîndar heya sibehê bikaribûya,
hemî stêrkan bijmarta nedimir

nayê jimartin stêrkên vê şevê
bûme arê bi araviya xwe bifetise
piçûktirîn delava li devê çeman
dixwaze  bihar bi serde bê!..
we talankerên çav jê tê bûye bihîstiye,
ev şev jî di talanê de ye
jana di tariyê de bi gewde bûye
mîna madê ciwanekî di şer de,
brûska şîn vedide

**7.**

serê dergûşê li ser sînga min e

xewa şîrîn bêyî morîka şîn e

**8.**

ew gewdeyê di kêliyek dîl de

bi te bûye çewalê kayê

serî li balîfa dastanan datîne

Zembîlfroş û Xatûn

şerbeta ar in, diherikin

yara bi heft caran li min heram e

biskek daye nav lêvan

bûye hewrê tasek ji ava qestelê

**9.**

ev e, deriyek li te vebû

ey şeva bi baskan dilê min pîkol dike

ger heyfa te jî heye li ser min

tu jî çend peyvên xama li ferhenga bê naverok zêde bike

bes e

bes e da tu tola xwe bigirî

**10.**

mîna destpêka zirav a çîrokan;

çi çîrok e gihayê kesk, asîmanê şîn, meşa zarokekî

çi ye ya ku li dengan bûye govendeke reşgirêdanê

bi gewdeyê hêvî û tirsê ve şîn tê

ku mayîn di kena wan de diteqin

**11.**

çûçikeke çolê li pêş malan,

bi serê baskên xwe, çawa erdê pîkol dike

tu, bi wî awayî, derdê min pîkol dikî

şeva bêkeys

şivanek neh salî bi çi helecanî,

pifî ava sarkanikan dike

tu, bi heman helecanî, bi qirşûqalên çîrokên min ketî

‘qehpikek’ bi çi serbestiyê,

benîşt dicû

tu aniha, bi heman bêxemiyê mejiyê min dicû

**12.**

zimanê me bûbû Eyûb

bê balîf, çav li şevreşkan girtibû

a ku nebû gol, bû perê hewran

birûsk vedide

**13.**

mirin, ne sar diherike

ne jî germ diherike mirin

çiyayek bê ax e mirin

gul lê li telşan dibişkivin

**14.**

a ku li dil bişkivî

li çav vekir

zêmarên te yên qîrî bûn

li cîgeran ar vereşiya

bêku metelmayî bimînim

neku dikenim

nagirîm

bi qasî spîndara çile matesar…

**15.**

arê ku bi xweliya xwe ditemire

ber çavên te dikeve

helbestên kêliyan bi bîr tîne

lê tu haydar î

ar li mêrga dil hatî vêxistin

**16.**

kuştin bila bimîne li daristanan

lê jixwe

wê çaxê

çîroka min jî wê serî bide xewneke şîrîn…

**17.**

deriyê mirinê li paşila dilê te vedibe

dixwînim hevokên ji nîvî ve jêçûyî

derî li kozika berxikên xeyalên min vedibe

**18.**

ey şevreşka çav lê bûne tas

jan dide wextê risteyên neşûştî dihonim

‘heywax’ên min bi pêsîra min ketine

ji serê rê fam nakin,

li nîvê rê,

dibin rêbir, dibin çolbir

bila ez li Heskîfê rawestiyama

bedena min bişibiya rû şikeftek li perava Dîcle

bibişiriyama bi janên servekirî re

pê bizanibe

helbestvan

li dû her peyvekê xwe ji gunehan dişo

**19.**

tu bûyî kevirê aş
ez teneyên ter, yên lawaz
ku ji simbila şîn de mame
hewrên janên min,
li tebeqa xemê sar bû
rihê min, di hêlîna li ser bistiyan de
zîpik di ser de dibare

ey xwendevan,
jîn bi qasî bayê şevê sivik e,
ne digazirînim
tenêtiya min jî maye ji min re
lê jiyan bi tenê ne ez im
bi vî dengî
ji newaya dirûşmeyan averê bûm
me çîrokên ji hin evînan genîbûyî xwend
welhasil ji Adem de maye ev aşît
û di her tiştî de heye
zimanê min lê nagere
lê jixwe
carna ev jeng li helbestê jî dide

**20.**

têjikek bi tenê mayî û qertelê ku di halana laşan de

li hev nakin

lê kevok jî hene

qulingên derbiharan

êdî şev maye li dera ha

bi ser tevnekê ketime

hew bila gazî bi ser min de neyê

kes nebêje hêvî di hembêza evîndaran de fetisî ye…

**21.**

ez dil

biavêjim ser kîjan sergoyî

**22.**

ey mirovno

mamosteyê lawê min karê malê daye wî,

“dinyayê bidin te tuyê çi bikî?”

keçika min bi dehan balon amade kirine,

ji bo şahiya Roja Zarokên Cîhanê

li ser her balonekê wêneyê zarokekê çêkiriye

li ser balonan yek bi yek nivisiye:

“îngilîz, fransiz, ereb, tirk, macar, yewnan…”

balonekê hilda dest,

li çavên min nihêrî bi lêborîn

wê peyva qedexe axîn bi wê da kişandin

“gelo ez binivîsînim…” pirsî ji xwe keçika yanzdeh salî

wê balona nebinavkirî da ber serê xwe

birayê wê bi awayek pirs arasteyî wê kir:

“dinyayê bidin te tuyê çi bikî?”

**23.**

ey ruhê di tîna navrojê de tê avdan

bibe bûkek feodal

dev li xwe rapêçe

bes tu dikenî

belê, her kes bi her tiştî dizane li van deveran jî,

her wekî çar hêlên rojhilat!...

dixwîne her kes ayeta "şikur"ê

şikur ku em ji hişê xwe ditirsin

şikur ku dilê me di dest me de ye!

hê jî baran dibare

şikur li te ey zemanê ku 'mar lê hatî birîn'…

**24.**

stranekê şiyar dikim ji xewa sibehê:

"va dîsa bû şev

xewa min nayê

van şevên tarî

dawî lê nayê."

**25.**

min bêriya newalekê kiriye
bav û dê di sohbeteke germ de
zarok bi lîsk in, kûçik conî dialêse
seba darikek çixatê badilhewa neçe,
keçika azev çûye malcîranan
ar bîne ji bo kuçik vêxistinê

**26.**

ma hûn in ên bextewar
an şivanê bi tirînca awêneyê
silav li yara xwe dida
‘qey hişê min îşa nayne’
qey yê ku hişwinda ez û ev şeva lal in
wextê tu dikenî
te hay ji dengê xwe heye,
kerem bike, biçe dengê kenên
li kerxaneyan bibihîze!...

**27.**

ji bo spêdeyan
min rêz wergirt li oldaran
ey xwelîserên li sikakan
bes bibêje,
“felek xaîn e, dinya ya bêbextan,
zordaran, diz û ewanan e..”
wekî oldarek ji spêdeyan de
li dinyayê şîrîn bibe
alîgirên te gula beyaran in
çiyayên dest bi hine,
şiveriyên bi dar in…

çi can dide te
ji vê bazarê vebikişe
bazara li paş dîwaran
wekî vê şevreşkê tari ye…

**28.**

cixare li min sar nabe
nêçîrvanek tîr avêtibe
kewa li ser hêlînê
çawa xemgîn û xembar dimîne
ez, aniha, bi wî halî
li bask û birînên peyvan temaşevan im
rengê roja berêvaran
xwe di rûyê min de daye der
dihelim
bi kalîn im
ey şeva bê kiras
mirovên ku jê hez dikim
ne bextewar in !...

**29.**

meşyana van êvaran bi kerb e
bi derd û êş e
derdan dibijêrim ji nav derdên parsek

li ser rûyê min ciyê reşahî jê de tê xar
reşeşîn bi ser de dibare
zerê şimayî lê belav dibe
sorahî xwe lê nade der
te dê bigota
rûyê
zarokeke menenjît lê daye…

**30.**

çar pirtûkên pîroz
me bihîst bi hezaran car navê wan
ew bi peyvên derbarê edaletê ve
li dîwêr man hilawêstî di van meseleyan de

lê jixwe
pirtûka pêncemîn e ku hukmê wê li jiyanê dibe
ew jî ji layê siyasetvan û desthilatdariyan ve hatiye nivisîn

tu, ey sê baskê pirtûka şeşemîn
yanî tu însanê sikak û kolanan
şaristaniya bi nalîn
û şinahiya erd û asîman
mîna xewna hênijandinan
bi ser hişê min dikevî

**31.**

gulberoj e rih

roja wê, kêliyek li goristanê ye

her kes diponije ji hewla can, yek miri ye û ew difikirin

her rih tenik, ber bi bihuşta xwe ve serî dizivirîne

rih

hespê hîpodroman e

bi xezeb

hew refleksa bezê pê re ye

rihêm

ne mîna arê dojehê kûr be li jiyanê

ne jî bibe eylo,

ne li bilindciyan li laşan bikeve halanê

bibe çûçikeke çolê

li pêş mala li qeraxê çiyê

bi bask erda hişkolekî pîkol bike…

**32.**

helbestvan wextê dicoşe

dibe zarokek bê fam arna

ji bo şîlana sor xwe diavêje ser bûta deviyan

hin hevok di çavan re diçin

bi coş im

bi çav re devî li ser dil dişkê

**33.**

stêrkên vê şevê nayê jimartin

ji xwe

naxwazim ji yekê wêdetir bijmêrim

bila îşev dengek hebe

yek helbest bi ser riya xalî bikeve

stranekê li hewa bibe parçeyek hewr

janeke tîr ew stran be

bi baskên birîndar ve

bi peyvekê bikele

navekî, miletek e

peyvek dîrokek,

helbestek dîwanek,

baskek hêviyek,

janek nameyek e…

**34.**

hewrê dagirtî

peyvên ji dilên dayikan de havênkirî

kulmek ax û dendikek

ji bo helbesta bi kalîn

bi pelgên wê bekeve

bi qasî bizinek ku li darekê serî dirêj bike

ji bo ku peyv nebe xeybane

lê jixwe

arê xewn û xeyalan lê dibe tîn

**35.**

kevir li Heskîfê ne sembola bêdengiyê ye
wekî te, ey şeva agir pêketî
te zaroktiya min xwend bi tevahî
li her deriyê dadayî da te
bûme keçikeke çîrokên kedîkirî
mame li benda zarokên li çolê
tu dêwek bi heftserî
li deriyê hesinî didî
xwîna min di tilîka qilîç de bi te şîrîn tê
dimêtî
ka çiyayên ku orîn pêdiketin
jixwe
li vir bûme zarokek bi xeyd
niçe niça min e
dizanim xwelî li rastiya xwe dikim…

**36.**

ey takekesê/a li derekeciyan

em bi oxira karwanê janê re bûn rêwî

bi yek kêfxweşiyê re,

hezar carî em dibêjin,

"ez bi qurban"

em zarokên wî welatî ne

ku

kes lê mezin nabe

ne heyire

em hê jî dipirsin

"ma ev nalet ji çi dibare?"

**37.**

psîkologên me kûçikên li pêş derî bûn

û tirsa masatkirî

bi tevî

çîrokbêjên destanên evînî…

**38.**

ey helbesta dişibe tamatêza di bin kayê de sor dibe
helbesta deng şîrîn
av -ji deng- xweş e
kevir -bi deng re- bi can dibe
baran ê bibare
deng bide
mîna malcîranekê

nalîn be jî
tu bi xortaniya xwe deng bide
da ku ev şeva bi birînên xwe re,
destmala govendê bihejîne…

**39.**

tu

mayî li benda sewdayek,

ey helbesta ku destê xwe ji birînên min de vekişand

ey şahida qatên şevan,

kêlî hene ku

malmîratbûyîna dilê min in,

wexta guhdarê "Hesenîko" me,

serê min, di xeyalan de,  li ser çongekê ye

ku tu helbest bî

helbet tu bûyî şinahiya asîman ya berêvaran

ku tu ji dil de herikî bî

helbet dê tu bi kesên di şevreşkan de hêsiran dibarînin re bibî heval...

di xatirxwestinê de, ji kewekê nermtir,

rêya xwe ji xwendevan averê bike,

pênûsa di serê dil de bûbû kêrek ko!

**AV Û BERF**

dilê min, vê kêliyê, wekî zemanek bênav e

berf e

dibe av

di navbera av û berfê de qeşa ye…

min  tîrêjê ji bîr nekiriye

av heye

berf heye

qeşa heye

û tîrêj heye

lê 'dinya ne ewr e'!

siya zinar bi ser min de ne mêl û xar bûya!

**RENGÊ WECHÊ KEÇIKAN**

silavdayîna li şevê çiqas rihet e

merheba bide hîvê

rihet e

guhdarkirina dengê avê

li dû

gera xewnên şevan

û axaftin

li welatek ku her peyvek bi qasî gulleyekê lê giran e

li welat

li dû xweda

'pêşeroj' di rêzê de ye

niha

ji eşqê re kes fedîkar in

serê gotinê mirin e

binê gotinê zêmar

bi torta xwe re diherikin

li welatê ku ji rengan pir tê hezkirin

rengê wechê keçikan naguhere

eşq ji bo çîrokan hatiye hiştin

siyek li ser berfê dimeşe

ne niha ne pêşeroj

ne eşq ne silava li şevê

sî dizane ku bilindbûna rojê tunebûna wê ye...

**ROJ JI KEÇIKÊ XEYIDÎ**

keçik li ser kevir rûniştî

li royê dinihêrî

hewr ket navbera wê û rojê

dengek bi keçikê ket:

“ro ji min xeyidî

ro ji min yedidî”

hewr belav bû

ro hat,

keçikê pişta xwe bi royê ve kir

milê xwe hilda,

“ez ji te xeyidîm”, got

tîrêjên royê li şibakeyekê diteyîsîn

qehirî keçik

rabû se piyan

bi hêrs bû:

“çima ez nikarim ji te bixeyidim...”

**SIBE HER SIBE YE**

sibe Newroz e,

ger gulên me di dilê me de vedin…

sibe Newroz e,

wê kevir û dar bi ser ziman bikevin…

sibe Newroz e,

ger dayik bi dilê şa bin;

wê, sibe, bibe “her sibe”…

sibe roja helbestê a cîhanê ye

ger helbestên me bi rê bikevin…

sibe,

wê helbest bibe newroz û Newroz jî bibe helbest

helbesteke bi şîr û şekir xwedîkirî…

helbesteke

bêyî sond û qesem

helbesteke

bêyî xwîn û birîn

helbesteke bibe kenê şîrîn

da, li dîwarên fedîkar, ji zarokan re bibe hêviyeke “hûr, kûr û dûr”...

**ÇIL Û HEYŞT**

(mirin nêz bû

belkî gelek dûr bû, ez nêzî wê bûm)

çi xweziyên min hebûn?

ê çavê min li dû min bimana?

çil û heyşt sal

dikirin çi?

hemşîreyê pirs dikirin da ez ranezêm

min dihesiband; çil û heyşt dikir çi?

seriyek vala

yê bêhesêb

li benda mirinê bûm

mirinê xweş bi hesaban dizanî

lê çil û heyşt?

gelo mirinê dizanî bê çil û heyşt dike çi…

xewnek; li ser herzêlekê, helbestên feqiyê teyran dixwendin… refek keç bi bilindciyan ve hildikişiyan. xwişkeke wî ber bi wî ve dimeşiya. wî kir qêrîn:

"ey mirin!"

şiyar bû… fikirî… feqî, ey avê, gotibû…. wî, ey mirin, gotibû di xewna xwe de… yê wî xewn bû…. yê feqî ne xewn ne jî xeyal….

**DU HEZAR Û ÇARDEH**

dem bi dem be

beriya sohbetê

di nav sohbetê de

li dû sohbetê

ev e

tu jî hatî 2014

dest bi hatina çîroka xwe meke…

**QAQLÎBAZA’M**

li peyva ‘jiyana duyem’ digeriyam

qaqlîbazek

“sipûsax “

“rengê çavêm, berxwedana lingê m in“

digot, “bibijêre”

yekî digot,  bi dengekî kûr

“ vegere

dilê te xalîçeyeke ji pêlan e

xwe li peyva germ bigire…”

**sibat 2014**

## RENG Û XEYAL

1

xewnekê ji te re vedibêjim;
li tiştek digeriyayî, tu,
ji min bêhay
li bendê bûm
gotinên xwe ji bayê sivik re bêjî, tu…
min ê ji peyvên xwe denê çêkira
teyê, li gorî dilê xwe, bireng bikira
ku bi ser rihê min de biherike

2

min dizanî kenê te bihar e
li keviyên wê kulîlk vebûn
li navekî digerim
ji bo kulîlkên li te vebûn
ji bo xatirê hezkirina te
navê kulîlkekê bû navê kilamekê
bêyî bimîne li benda min
bêyî destên min li bedena te bikevin
bêyî bêhna xwêdanê bi ser min bikeve
dilê min xweş dibe di hezkirina hezkiriyan de
dikenim
tiştin di kenên min de şax didin

**3**

peyvên bi qat

dikarim bi peyvan bigirim êdî

peyvên dişibin kevokên te yên qulibok

tu

deftera te

gezên te yên li lêvên te

û çîrokên teyên gotegotî

ji helbestan jî derdikevin

û xwe li riyên siviktirîn digirin

**4**

tu hatî

vegere û biçe

bila hatina te wekî dereweke be

çûyîna te henekek

tişta kevn nabe zû bi zû kevn bike

da bêhn li tiştên nû neçike

**5**

deng

baran dibare

tu ber bi defterê ve diherî

bi hesret

peyva ku li ser dilê te germ bûye bêtebat e

**6**

tu hin risteyan dixwînî...

ji min tê ku bêjim

bi ya dilê hemî hezkiriyan dikî

bi ya dilê xwe dikî

ka bihêle

ji zûde ye bi wan risteyan dizanim;

beriya ku tu binivîsî

min ew dixwendin

di nav sohbetên te

yên

efsaneyî de

**DORA QURBANIYÊ**

xwedawo,
ma dora qurbaniyê nîn e?
li ber têlan
li der û dertûlan…
ne herfek maye bêyî xwîn
ne risteyek maye bêyî hawar
heyrana we me, ji vê re nebêjin helbest...
ji dil de
mame bêyî nefes…
aniha,
hewa jahr e
dîmen kêr û xeber şûr in…
hûn niha çidikin ez nizanim
nivîskarek, di kêliyên wisa de,
incex dikare ew qas
bêçare
bi hest
di zîndanekê de be…
zarok, jin, kal û pîr
dimeşin;
nizanim ji ber çi zemanî, ber bi kîjan zemanî ve!
ev çend zeman e
çend koç e
çendî qetlîam e…
gelê ku bûye qurban,
her dibêje, va me, li ciyê xwe me,
ey bed-î însan…

**20.09.2014**

**LI BENDA BIHAREKÊ**

mabûm li benda biharekê;
tu tê de gula devê çeman...
li ber devê çemekî bûm;
li xwe û li çîroka qirşikekê difikirîm...
payîz hat;
mirovên bi rûpoşên reş,
bêyî ferheng in;
gul heram e
xwîn helal e!

**29.09.2014**

**MEMÊ ZINDANÎ**

**A**
me ji birînan reng dibijartin
ji nav birînan birîn dibijart;
qe nebe, yên hinekî kewîyayî
hinek jê temendirêj
hinekî servekirî...
me gotina herî bi qedir
bi reng, dîyarî hîvê dikir
em hîn bûne;
di tariyê de xeyalên me yên rengîn
navekê li dilê me dikin;
dilê min,
rengan bihêle ji bo evîndaran
dûr biçe ji deriyên helbestê
bi serserkî bimeşe
belkî wekî Siyaben tu di gelî de wer bî

**12.09.2014**

**B**
heger ku tu mayî
bêyî hîv
xeyal bûn pelgên hişk
li çîroka Memê zindanî vegere
navê jahra vî zemanî ez jî nizanim
belkî "zeman" e, kî dizane...
*Navê helbestê "Kewiyayî" bû hate guherandin û beşa duyem lê hate zêdekirin.

**13.09.2014 saet:00: 49**

**TÊL**

têl ku bibin sînor

nihêrîn dûr dimînin

xwîn ji zeman diherike

têl ku bibin sebeb zarok raweste

azadî dibe xewneke ku bi roj tê dîtin…

**DICEMIDE**

bêyî demsal

beriya dest û lingan

parçeyek ji cîgera min dicemide

**ŞEWAT**

ev dixan ji xaniyên cangorî bilind dibe

ne bêhna nanê genim jê tê

ne jî bêhna bijênekên ji dawa mihên

serhedê

reş e

di çavên almastî de

weke marê reş hildikişe

**1995**

**BIRÎNDAR**

ax ji wê tîtir bû;

dilopên biharê lêvên wê

xwîna wê jî ax şil dikir

çendî kanî di canê wê de der bûbûn

sosinekê di ser hinarikên rû de tewand

**1996**

## ÇAVÊN GOJÎBÛYÎ

peyvên ku bi tîna dilê Zînê kelya ne
bi tevî peyvên helbesta sê hezar gundê
şewitandî
xam in…
melodî,
ji tepîna dilê çivîka di nav nukulên qertel de
nermtirin
xamiya peyvan ji hevokan re bûka du salî ye
peyvên ku wisa xav û xam mane
bo pênûsa ter
wek xofa marên li ser zendên Dehaq in
di nav xumamiya vê şevreşkê de
çavên zarokên gojîmestî
bi tevî peyvên qusyayî
kawîsek di dilqê bêrîvaneke derengmayî de ne
**1998**

**DENGEK BIHARE**

dengê bihare
dengê sipî yê zivistanî
tarî ji dilê min diherike
şev li benda min e…
ku tu nayê çirayek ditemire;
tarî diherike
şev li benda çavên te ye…

**ZAROK**

zarok pêsîrên yezdan in
diherikin, servekirî û bi newa
zarok helbest in
tê de peyvên wek hêlkanan…

## WERE

çima çûyîn hebû hatin tune
tu çûyî
were
were
were
qelem bêdeng e
deng mane ji şevên ker û lal re
hey hawar hey medet
hey hawar hey medet
kî bû ya ku çû
û
li min venagere
berf e
çîrok çîrokên berfê ne
berf e
stranên ji berfê ne
were
stranên xwe bîne ji me re
çîrokên me ji berfê ne
sar e
em dicemidin
çîroka xwe bîne
min roman lêdikirin nedibûn çîçeg
min çîrok lêdikirin nedibûn kulîlk
reng venedida

hatim

hatim, ji bo kulîlkekê,

min li deriyê helbestê da

ji bo ku kulîlkek li min vebe

min xwe avête ber bextê helbestê

kulîlk li navekî digere

were

were

min nav ji bo te hiştiye

were

were

bila kulîlk vebin

ez vegerim

tu û kulîlkê bimînin bi dilê xwe.

**JAHR**

sal bibûya dêwek heftserî
û rojekê ji xwe bixwara;
roja şonzdehê adarê…

zeman di destê xwînxarekî de
bi rengê sor bû;
jahrê
dengê çivîkan dixwar
zarok bêdeng dikirin
jar dapaliye, jar
bi emra mirovê har
jar herikiye jar;
wêneyan dixwînim;
lêv li zarokan sipî
çav li dê û bavan nîvevekirî

li min sar e
biken in berxikên helebçe
jar bariye, wech spîsar, ne ken e reng mehne guherîne

can
can dinale
yên ku mane li mal e
can dinale
nalîn jan e
jan helebçe
**2002**

**LEYLA**

leyla berîvana peyvan e;
ji peyvan dengek didoşe…

bûye şahmarana çîrokekê
ew ê
serê xwe bide ser rêyekê…

leyla qelema xwe danye ser dil
ka
we li ku bihîstiye ku qelemên li ser dil wê werin rakirin

**ÎRO SAL 2015 YE**

ax

xwezî

ez baskê peyvekê bama

li ber goristana zarokek Helebçeyî

ax

xwezî

ez tîpek nû bama li alfabeya me

wê peyveke nû bihata çêkirin

bo hawara dayikek Şingalî

ax

xwezî

ez hêviyek bama

bi qasî nihêrînên keçikeke welatê xwe

ku

mirinê terbîye dike!

mirin bênamûs e

li rojhilata navîn!

çend peyv hatin dîsa,

nizanim nizanim ji çîroka kê!

ax

xwezî

**30.03.2015**

## CIYÊ KU ROJ LÊ HILTÊ

ji aliyê roj lê hiltê
çivîk bi tirs in
zarok bêlîstik mane

***Serê meha Tîrmehê 2015***

**SERGO**

sergo mîna dilê dagirkeran
dîwar lê nayê lêkirin

**1998**

## TÎNA PÊNÛSÊ

û dem kêliya li ber devê şûrê şêr
pênûs şara zirav
li stûyê min
bihar e, belekî hêsran sar dikin…

**2001**

**TÎN**

darek li devê şiveriyekê
li ser darê hurmiyek çolan a bi birîn
di destê zarokekê de kevirek saxsî
kevir
weke pênûsek serberedayî
li dû azadiyê dilive…

**2001**

**ŞIVEHELBEST**

**(1)**

ez bahr im

ma tu dikarî

min di bêrîka xwe de veşêrî

**(2)**

di peyvên bê pizdan de

silavên me hen in

**(3)**

ev rêwitiyên bê pêsîr in

ev çûyîn

bi dagerîneke bi pêsîr re tirş dibe

**(4)**

bi çend peyvan

agir bi evînê dikeve

tu ranehêjî satila

bê av,

dê bi hatina te bitemire…

aştî ceng e

çekan dirizîne

**(5)**

hewa di destê min de benek e

dikişînim

naşibe zincîrê

ne jî dişibe hevrîşîm

hew rengê wê

ji rengê berfînên virnî spîtir e

**2001**

**DANÊN HELBESTÊ**

roj li seranserê hestan germ bû
hemî peyv bê hevalkiras in
li mitbaxê
hinan jê avzelalî dikim
nalîna hevokên teşenekî
ji pirtûkên tazî tê
ben li stûyê ga sist dikim
ev topçîn jî dimîne erda xalî
ezê kafesokan
bi bêhnên cixarê
livbaziyan lidardixim…

**2001**

## ŞAR

di paceyên kargehan de dû zirav hildibin
askor di teniya bazarên sayakî de
ji birînên sar reştir...
di pêçeka koçberek de
dergûş ji pûşê payîzê siviktir
dîsa bûye mij û dûman
tê de berxik bi devê gur ketye...
keçikek ji bazarê tê
li ser sînga wê sêv in
bi hêlek sêvê ve çavan girê dide:
"va ye rengê çavên min"
alî sêvê ê din dest reşeşîn kiriye:
"ev e, jiyan bi vê re serî daye rê..."

**2001**

## ÇEWKÎ

tarî pelek e
heya bi kevir ve neyê girêdan noqî avê nabe
ronî av e
heya li zinaran asê nemîne
deng nade
deng ax e
heya li dest nekele
meriv pê hişyar nabe
hişyarî dengdayîne
heya têlên xam nebe pel û bi ser avê nekeve...
ax deng e
ronî xav e
deng av e
ronî deng e
av jî tê çandin ji deng nermtir
di deng de jî ronî di serî de
di dest dayîka min de bû dergûşek
û
bi dû bayê hêviyê ket…

**1998**

**PIRTIYÊN HEVOKAN**

dû ziraaav hildibe dîsa
rêzên kartî li ser pelên pirtûkê
şirdanên hişk in…

di şoreşa peyvan de
bi hezaran hezar sal bûne aniha
niha jî li hemî deman distewe…

lingên xwas
riya dirêj
can li min bêjing
her kaniyek lê derbûyî
wêneyek dihewîne

ku gavekê biavêjim
wê rez û bîstan
"dest biavêjin pêsîra min"
dê ax li birînên ristan
bikewe
û helbestên me weke erda kaniyên miçiqî
hişk bibin!

**2001**

**REŞBELEK**

weke serseriyek ku bi şev ji sikakan averê be
ez ji wî bajarî averê bûm
qasî dergûşekî bi dilsarî

wêneyek bajêr li dîwêr, ji helbestan re bûye kan û kanî
helbest
ji min serserîtir
**2001**

**ZEMANÊ BIRÇÎ**

emrê min, bi rêya xwe de here
seba min li navan negere
ruh hemî nav pûç kirine, 'jan' jî tê de…

kî dikare janê azad bike…
jan jîn e
jîn ne jan e…

çîrokên ruh bihêlin li dera ha
aqil diçe
bêhn bi pûşê çîrokan dikeve

bi kesîretî
ez hatime warê peyvên kûvî bibînim
tu dibêjî, ' gulan biavêje paşila min'

zeman
zemanê birçî!
yên ku peyvên xwe difetisînin
helbestên esmer dane berf û baranê
te,
emrê zimanekî pûç kir
tuyê helbestên hêşîn bidî çi?
zemanê sor!
**2015**

**AZADÎ**

Qoço, kûçik û pisîka xwe

li xelxwetxaneyan
'welatek' ava kiriye
welatek bi qasî sê heyberan...
(wextekê li deverek vartoyê)

Qoço bêdeng...
Qoço... Mirovê dunya xwe ...
Dunyayek dûr, dunyayek nêz, dunyayek bi fizildûman...
bi ba û bager
dilê Qoço filanîstan...

wî wextî

ji bo beriya wan wextan

Qoço ji avê pirs pirsîne

ji kevirek bi hinne pirsiye

vegeriyaye deng li dilê xwe kiriye;

rojek ji rojê zûtir,

ji Erzirumê heya Bedlîsê

li keviran binihêre, li dar û beran

belkî Xalid Begê îşaretek xwe hiştibe...

dilê Qoço yê din hatye hawarê,

gotiye,

“Olo Qoço,

îşareta Beg peyvek e,

tu dikarî, bi dengê qube, bike qêrîn û bêje, azadîîîî…

çîrokek

di sîngê Qoço de bûye têjikek çûçika çolê

li tarîbara perpitiye

dengek din hatye

gotinek din hêşîn bûye li ser dilê Qoço:

“azadiyê heya niha  serê kesên çê xwariye…”

## GIHAYÊ HEWŞÊ

dengek di dilê min ê xalî de olan dide;

ax, xwezya me ji dilopan

pelgê gulekê şil kira…

ax, xwezya dilê me nebûba lehiya biharê…

ax, xwezî beriya dilê me serê me biêşiya…

ax, xwezî gihayê hewşê bi hewşê şîrîn ba…

## ÇARŞIYA VARTOYÊ

waweylê!

li Çarşiya Vartoyê

bedeneke şilfîtazî...

Tu her bijî "qehremano"!

Tu pir bijî!

Her şev bi xewn bî!

Heya sax bî li dara dunyayê,

Çîrokeke te jî heye, çîroka te û bedeneke mirî ya şilfîtazî!

**KANÎSARK**

de bêje Kanîsark de bêje
tuyê bêjî yan ez bêjim
dizanim ne tu dibêjî
ne ez dibêjim

tu diherikî diherikî diherikî
dilê min jî mîna te ye
diherike diherike diherike
dibêje û dibêje
ew dibêje kes nabihîze

tu çi dibêjî Kanîsark
tu çi dibêjî
çi heye di nava zelaliya te de
nebêje Kanîsark nebêje
ez dizanim tu çi dibêjî
ez dizanim tu çi dibêjî
nebêje Kanîsark nebêje
nebêje bilûra dilê min
nebêje tembûra dîlanan
nebêje Kanîsark nebêje

tu çi dibêjî
ez çi dibêjim
ez hatme ji te re çi bêjim Kanîsark
ez nizanim ez hatme ji te re çi bêjim;
ez fîrar û mehkûmê dilê xwe me…

**KELEHA MÊRDÎNÊ Û FILANÎSTAN**

pelek li bistiyek asê mabû
zer û zaferanî
li hevrazên kelehê
lîlandina bayê
reyhanî  reng û deng didan zemên

Mêrdîna dilan...
Mêrdîna xewn û xeyalan...
Mêrdîna  ku li ser devê oryantalîstan benişt
hê jî ji bo zarokek pêxwas
mekanê xewnên şewiti ye...

li dîwêr pelên dara hejîrê
reng dimeyin
deng dimeyin
sewt dimeyin

dîn
ziman
bi hemî rengan
Mêrdîn hê jî govenda xwe digerîne...

li serbaniyan
reqsa reyhaniyê
deriyê bexçeyên "filan"îstanê vedike...

**JAN**

temenê janê li welatê min bêhesab e

dêw e Jan

ji qerarên li ser maseyan maye ji me re ew xelat ew mizgîna tarî zilmat!

ne şevek e wê sibe lê were ne jî mirovek e em bimînin li benda mirina wê

û

ne helbesteke sar e were ji bîr kirin

“qerar”

li ser stuyê welatê min bûye navek ji navê axirzeman…

siwarên janên me, maşellah, ji her dînê ne

li meydanan

ji bîr dikin dîn, îman û ayînan;

qeyde bi qeyde

ji me re hê jî “kilama bavê lalo” dibêjin!

çi çrok e

çi lîsk e ev;

çi li Rojava çi li Rojhilat

her kes bûye zarokek

kaniyekê şîlo dikin

li vê dara dunyayê…

dengê dayikên me ketye têlefonan

li dûriyê

her kêlîkekê baskê peyvekê li wan dişkê

BAJARÊ XWEDAWENDAN

Ku raman dike orîn
Heskîf dike nalîn
hewrên ji çavên bedewan reştir
li gola tî dicivin

**1995**

KARESATÊN TENIK

Wextê lêvên te weke berfînên zozanan dibişkivin
ji çavên te tîrêjên biharê dikişin
li ber rezên avdayî dibin destan
li welatê me
hewrên reş
di ava Dîcleyê de wenda dibin

**1999**

## BIHARA DÛR

helbestek
bibû çivîkek
firya firya
firya haaat
li ser şaxek dilê min danî...

pir diçû hindik diçû

çi kulîlk hebûn deng lê dikirin

çiya kehr kulîlk bi deng

gur westiyayî berxik bi çindik bana…

dayikan xewn û xeyal didan ber serê xwe…

deng diman ji bayê re;

"Ez ê herim"

-Kuda?

"Ber bi peltek hewrê gewr î şehkirî ve!"

-Meçe, belkî hewr rêya xwe biguherîne!

-Heke ku hewr bû dilop û bi ser çavên te de herikî, wê hulma min ya germ ji bo te bibe hewrek xeyalî…

pir difikirî hindik difikirî

çi dar hebûn mabûn bêyî pel

Gotê:

-Meçe, heke ku tu diçî, bibe reşêleyek û bi nav refê xwe keve;

bihar dûr be jî wê were…

**PEYVÊN ZINDANÎ**

Tu çûyî, bila temiya min li te be,
Bêje,
Ew, bi zimanekî birîndar re,
Ji avê re dibêje, bihar tê…
Lehî radibe
li dilê xwe vedigere;
peyv zindanî

AV Û BERF

dilê min, vê kêliyê, wekî zemanek bênav e
berf e
dibe av
di navbera av û berfê de qeşa ye…
min  tîrêjê ji bîr nekiriye
av heye
berf heye
qeşa heye
û tîrêj heye
lê ‘dinya ne ewr e’!
siya zinar bi ser min de ne mêl û xar bûya!

CÎHAN ROJ

